Bê guman, tu şek û gumana min ji bawerî, vîn û berxwedana YPGê û HSDê nîne. Lê, di rewşa niha de ku dinya bi zimanê çekên giran diaxive, bi zimanê dîplomasî diaxive, bi psporiya siyasetê diaxive, tenê bawerî, vîn û berxwedan têrê nake. Mînak, li Kobanê destanên berxwedanê hatin nivîsandin, lê eger balefirên hevpeymanî û pêşmerge nehatibane hawarê, Kobanê ketibû. Mînak, li şerê Vêtnamê, xelkê Vêtnamê bi milyonan qurbanî dan, lê eger Yekîtiya Sovyet di warê çekan de ne harîkar bûya û yekîtiya xelkê Vêtnamê ne xurt baya, Vêtnam bi ser nediket.

Demhat Dêrikî

Divê em xwe nexapînin, divê em rewşê rast bibînin, ev qonaxa metirsîdar bê yekrêziya nav mala Rojava, bê yekalîkirina nakokiyên di nava partiyan de, bê dîplomasiyeke xurt û xwendina rojevê di warê siyasî de û bê hogirên durist, ev rewşa metirsîdar vale dernakeve.

Eşkere dibêjim, rewşa Rojavayê Kurdistanê di metirsiyê de ye û dibe ku hemû destkeftiyên heyîn ji dest biçin. Çima?

1-Partiyên Kurdan ne yek in, tenê gorna hev dikolin û berjewendiyên xwe li ser berjewendiyên milet re digirin.

2-Hogirên (dostên) Kurdan nînin, siyaseta Amerîka beramber Kurdan ne cihê baweriyê ye.

3-Tevgera Kurdî di warê diplomasî de di bin sifrê de ye.

4-Siyaseta Kurdî hêj sînorê dirûşmeyan derbas nekiriye û ji dîrokê encam wernegirtiye.

Nexwe ji bilî lixwevegerînê û yekrêziyeke di berjewendiya miletê Kurd de di navbera partiyên Kurdî de û berjwendiya miletê Kurd bingeh bê girtin, nîne.

Ev yekrêzî dê hêzên mezin jî pêdivîdarê xwe bike û mafê çarenivîsa miletê Kurd misoger bike. Dibe ku bûbe dereng jî, lê tenê yekrêzî çare ye, ne berjewendiyên partîtî.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Hunermendê Kurd Hejar Seyda: “Hunermendên Rojavayê Kurdistanê ji hunermendên parçeyên din, zanatir û xurttir in”

Hejar Seyda di 1971’ê de li bajarê Qamişlo çavên xwe li jiyanê vekirine.
Xwendina xwe ya seretayî û navîn li bajarê Qamişlo diqedîne. Her li bajarê Qamişlo, bawernameya “Bekeloryaya Wêjeyî” disitîne.
Lê ji ber sedemên aborî, êdî dest ji xwendinê berdide. Paşê, tenê bi qasî du mehan li peymangeheke taybet, muzîkê dixwîne.
Hunermend Hejar Seyda ji malbateke Kurdperwer û welatparêz e.
Bavpîrê wî “Cemîlê Seyda”, serleşkerê Şoreşa Şêx Se’îd bû û li ser destên cendirmeyên Tirk, şehîd bûye.
Bavê wî yê bi navê “Mihemedê Cemîlê Seyda”, yekemîn kes e ku nexşeya Rojavayê Kurdistanê çêkiriye.
Hejar Seyda hêj biçûk bû, huner û helbest bala wî dikişînin. Ji vê yekê di zaroktiya xwe de rêya hunerê dişopîne û hetanî aniha berdewam e.
Di roja îroj de, Hejar Seyda xudanê 4 albom û 60 sitranî ye, lê di geşta xwe ya hunerî de pir zor û zehmetî dîtine.
Di vê hevpeyvînê de, jiyan û xebata hunermend Hejar Seyda, binasin...

Hevpeyvîn:Ferîd Mîtanî

-Hunermend Hejar Seyda, kengî rêya huneriyê şopand û bi çi awayî dest bi geşta xwe ya hunerî kir?

Dema ez zarok bûm, min pir li sitranan guhdarî dikir. Bavê min jî helbestvan bû. Di mala me de bi awayekî berdewam civat çêdibûn û tê de helbest dihatin xwendin.Bandora vê yekê jî gelekî li min bû.

Îcar birayê min jî li defê dixist, lê ne bi awayekî pisporane.

Min jî xwe hînî def û ritmê kir. Dem bihurî û ez di dibistanê de giham refa şeşê.Di wê hingê de pêşbirkeke hunerî li ser asta Parêzgeha Hesekê çêbû û ez tevlî bûm. Li ser asta Parêzgeha Hesekê, hem bi defa xwe, hem jî bi dengê xwe ez kesê yekemîn derketim û min xelat wergirt.

Bi vî awayî, jiyana min a hunerî dest pê bû.

Dixwazim bibêjim ku ez aşiqê tembûrê bûm û min gelek caran bi textik û têlan ji xwe re tembûr çêdikir.

Lê dema ez bûm refa 7’ê, êdî min ji xwe re tembûrek kirî.

Malbata min jî wekî civaka wê demê, li hunerê dinerî wekî ku karê mitirban e. Ji vê yekê dêya min tevlî birayên min digotin ku karê sitranbêjî û sazvaniyê pir şerm e û dixwestin ez wekî mirovekî xwendevan xwe li pêş bixim.

Birayê min 3 tembûrên min şikandin

Malbata min li pêş xebata min a hunerî dibû asteng û kelem. Birayê min 3 tembûrên min şikandin. Îcar min nekarîbû li malê bistirêm, ne jî li tembûrê bixim, ji vê yekê ez diçûm mala hevalê xwe Riyad Şero û li wir min xwe li pêş dixist. Bavê min tu caran ji min re nedibû asteng û piştre dema ez hînî sazê û sitranbêjiyê bûm, êdî bavê min pir kêfa xwe dianî.

Tu kesî ez hînî tembûrê nekirim, ez di demeke zû de û bi awayekî jixweber, hîn bûm.

-Di jiyana te ya hunerî de, hunermendekî taybet hebû ku bandor li te kir?

Min pir li Cemal Sadûn û Hikmet Cemîl (Bengîn) guhdarî dikir. Kêfa min ji wan re dihat û min gelek sitranên Bengîn gotine.

- Yekem alboma te kengê tomar bûye?

Di 1993’yê de min alboma xwe ya pêşî bi navê “Yara Min Kurdistan e” tomar kir.

Tomarkirina vê albomê jî bi alîkariya hunermend “Behaa Şêxo” bû.

Ji beriya salên 90’an jî hewldanên min hebûn, lê ji ber sedemên aborî derfet çênedibû.

Hetanî niha, min 4 albom tomar kirine. Û 60 sitranên min hene.

Tevahiya sitranên min ji awazên min in, û piraniya wan jî ji gotinên min in. Ne tenê wilê, lê belê min awaz dane hevalên xwe jî.

-Pirî sitranên te ji gotin û azawzên te ne. Gelo ji bilî sitranbêjiyê, tu xwe ji helbestnivîsîn û awazjeniyê jî nêzîk dibînî yan na?

Jixwe behremendiya min ew bû ku min hem sitranên xwe dinivîsîn, hem jî bi awaz dikirin. Taybetmendiya min ev e.

Tevahiya sitranên min ji awazên min in, û piraniya wan jî ji gotinên min in. Ne tenê wilê, lê belê min awaz dane hevalên xwe jî.

Ji ber çi min helbest dinivîsî, ji ber ku bandoreke mezin a bavê min li min hebû.

Jê û pê ve, min helbestên Cegerxwîn, Dildarê Aştî û Aldarê Kurd jî kirine sitran. Û bi tenê sitrana “Ji dûr ve”, ew ya hunermend Ridwan Dêrikî ye.

Ez gelekî poşman im ku min gelek sitranên folklorî negotine.Xwezî sitranên min tev de nûjenkirina folklor bûna.

-Sedemên bijartina te ji nûjenkirina sitranên folklorî re çi ne...û evan sitranên gelêrî çi da te yan jî çi li behreya te zêde kir?

Her ku mirov mezin dibe û di kultûra Kurdî de kûrtir dibe, mejiyê mirov bêhtir vedibe û zanatir dibe. Sitranên me yên folklorî, nirxekî wan ê hunerî yî pir buha heye. Ez gelekî poşman im ku min gelek sitranên folklorî negotine.Xwezî sitranên min tev de nûjenkirina folklor bûna.

Belê, ji ber dewlemendî û xweşiya wan sitranan, min ew nûjen kirin.

Jixwe piraniya wan sitranan ên Yûsivê Çelebî ne. Ez dibînim ku Yûsivê Çelebî yek ji gewreyên Kurdan e.

Sitrana “Were Yara Min”, min ji evîndara xwe re çêkir.

-Di sala 2007’ê de nav û dengê Hejar Seyda li seranserî deverên Rojavayê Kurdistanê belav bû, ew jî bi saya sitrana “Were Yara Min”. Ev sitran ji kê re bû û di jiyana te ya hunerî de ev sitran cihê xwe li kû digire?



Wêne:Amir Remo

Sitrana “Were Yara Min”, min ji evîndara xwe re çêkir.

Ev sitran di 1996’ê de min tomar kiriye.

Paşê min xwe ji debar û abora xwe re vala kir û bîstekê ji hunerê bi dûr ketim. Bidûrketina min jî ji ber rewşa aborî û nebûna derfetê bû.

Hunera min tenê di çarçoveya civatên teng de ma.

Vê yekê hetanî 2007’ê dom kir.

Min dixwest ku ez bi sitrana welatparêzî bême naskirin.

Êdî hevalên min hew bela xwe vekir û ji min re gotin ku hestên te xweş in û divê tu tiştekî tomar bikî. Ji vê yekê min sitrana “Were Yara Min” di 2007’ê de nû kir, û tomar kir. Ev sitran bi rêya mobaylan pir belav bû û dengekî mezin da.

Ev sitran bû nasnameya min, lê min pir sitranên welatparêzî yên jê xweştir tomar kirine. Min dixwest ku ez bi sitrana welatparêzî bême naskirin.

40 sitranên min ên welatparêzî hene, lê baş belav nebûne û hin ji wan tomar nebûne.

-Mihemedê Cemîlê Seyda yekemîn kes bû ku nexşeya Kurdistanê çêkiriye, her wiha bi tevgera xwe ya wêjeyî jî navdar e. Lê tu wekî kur, çawa bavê xwe didî naskirin?

Di malê de, herî zêde kêfa bavê min ji min re dihat. Didît ku ez li ser şopa wî me. Ez gelek caran di civîn û rûniştinên wî de amade bûme û hetanî niha jî tiştên wî li cem min in. Jixwe bavê min gelekî navdar bû, lê ez jî di belavkirina berhemên wî de hetanî niha, dixebitim. Ez dikarim bibêjim ku bandoreke bavê min a pir mezin li ser min hebû.

Îcar her helbesta ku min binivîsanda, min pêş bavê xwe dikir. Pir kêfa wî dihat.

Hunera xurt û hunermendên xurt, her zemanî hene. Lê belê di dema îro de pir kes hene li hunerê siwar hatine.

-Eger em der barê birêveçûna hunera Kurdî ya li Rojavayê Kurdistanê de danberheviyekê di navbera roja îroyîn û 30 salên berê de çêbikin, gelo tu rewşa hunerî ya wê demê çawa dibînî û ya aniha çawa dinirxînî?

Hunera xurt û hunermendên xurt, her zemanî hene. Lê belê di dema îro de pir kes hene li hunerê siwar hatine. Ne karê wan e, lê belê ji xwe re kirine kar. Ev jî ji ber wê yekê tê ku, belavkirina sitranekê bûye karekî pir hêsan. Lê belê berê ne wilê bû, tomarkirina sitranekê pir zehmet bû.

Nerîna min ji hunerê re cuda ye. Huner hest e.

Kesê ku karibe bi hestên xwe û bi dengê xwe hunera xwe bigihîne milet, ew hunermend e.

Hin kes hene ku bi sedan sitran gotine, lê tu bandora wan nîne. Berovajî wê, carinan hunermendek sitraneke bêmuzîk tenê bi dengê xwe disitrê, lê belê ew sitran bandora wê heye.

Li Rojavayê Kurdistanê hem hunermendên kevin, hem jî yên nû, hêj bandora wan li dar e.

Bi nerîna min, hunermendên Rojavayê Kurdistanê ji hunermendên parçeyên din, zanatir û xurttir in.

-Di dema îroj de, çi projeyên te yên hunerî hene?

Mixabin. Ev demek e ku ez li welatê xerîbiyê me. Berî çend salekê derfeta hevdîtinên di televizyonan de hebû. Wê demê me baş qedr û buhayê xwe nas kir û me xwe wekî hunermend dît.

Hunermendên ji nifşê min û yên berî min jî, gelekî astengî dîtin.

Tu projeyên min ên hunerî tune ne. Lê di her hilkeftekê de ez sitranekê li malê tomar dikim.

Ez ê di demeke nêzîk de vegerim

-Ev 4 sal in ku tu li Tirkiyê dijî. Sedemên derketina te ji welêt çi bûn û gelo tu yê venegerî?

Mijara vegerê, her ez ê vegerim.



Sedemên derketina min jî ji ber pirsgirêkên aborî bûn.

Ez demeke baş li welat bê kar mam. Çar zarok di sitûyê min de ne, ji vê yekê ez hatim Tirkiyê.

Ez ê di demeke nêzîk de vegerim.

Mixabin, gelek hunermend û nivîskar hene wekî ku dijminê doza xwe bin, tevdigerin. Her timî aliyên neyînî dişopînin

-Diyar e ku mala Kurdî hêj bi ser hev de nehatiye û dubendiyên partîtî û siyasî hêj jî li dar in. Gelo ev rewş, çi bandorên wê yên neyînî li ser tevgera hunerî hene?

Divê ku hunermend, ziman û çavên miletê xwe be.

Divê ku kesê hunermend ji hemî aliyan ve bi doza miletê xwe ve bête girêdan. Heman tişt ji rewşenbîr û nivîskaran jî tê xwestin.

Her wiha ji erkê hunermendan e ku tiştên civaka xwe yên neyînî, bi rengekî erênî bidin xuyakirin.

Divê ku em hunera xwe, bi pêdiviyên doza miletê xwe re bidin pîvan.

Mixabin, gelek hunermend û nivîskar hene wekî ku dijminê doza xwe bin, tevdigerin. Her timî aliyên neyînî dişopînin.

Em di demekê de ne ku pêwîstiya miletê me bi moraldayînê heye.

Ez dibînim ku divê her timî kêfxweşî û şoreşa miletê Kurd li dar be.

-Peyama te ji civata hunermend û miletê Rojavayê Kurdistanê re çi ye?

Ez wekî mirov û hunermendekî Kurd, hêvî û xewna min ew e ku ev milet bi serfirazî bijî.Ev xewna bav û kalan û ya her mirovekî Kurdperwer e.

Banga min ji hunermendên Kurd re jî ew e ku hunera xwe li pêş bixin, û zanibin ka çi disitrên.

Li muzîka her çar parçeyên Kurdistanê û ya cîhanî jî guhdarî bikin, da ku em ji yek ritm û yek qalibî, derkevin.

Huner û hunermendên me yên Rojava pir xurt in.

Ji bo çêkirina vê hevpeyvînê, ez sipasiyên xwe ji bo te pêşkêş dikim.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Sedemên Koçberiyê

Anahîta Sîno

Wekî miletê Kurd ê li Rojavayê Kurdistanê dijî, ji me re xewn bû ku rojekê ji rojan li cihekî fermî bi zimanê xwe biaxifin.

Li kêleka wê yekê, gelek tişt hebûn digiha wê astê ku me ceger nedikir em xewna wan bibînin.

Lê ew tiştên ku ji me re meraq û xewn bûn, îro li ber çavên xwe, em dibînin.

Na, ne tenê wilê, lê belê gelek tişt hene asta xewnan jî derbas kirine; wekî: Zimanê Kurdî, Çanda Kurdî, Dibistanên Kurdî, Hêz, Asayîs û hwd...

Lê tevlî wilê jî, milet roj bi roj dixwaze derkeve derveyî welat, hêdî hêdî derdora me vala dibe û Kurdên me êdî li hemû cîhanê belav bûne..

Gelo sedem çi ne?

Bê guman tiştekî bê sedem tune ye. Her diyardeyek sedemên wê hene.

Îcar koçberiya bi vî rengê zêde, çima li Rojava berdewam e?

Yekemîn sedemên koçberiyê, pirsgirêkên partiyan, nakokiyên siyasî û mijûlbûna hin kesan bi berjewendiyên kesane ve ye...

Hetanî giha wê astê ku li ser mijarên çarenûsî jî, tu aliyek ji aliyê din naxwe û êdî evan sedeman hêla ku miletê me hizrên neteweyî ji bîr bike.

Hetanî ku li ser perçebûna me milet dûrî hev ket, şerê hev jî kir,û kurdewarî welatparêzî, bûn tiştê herî dawî ku pê mijûl dibin.

Vê yekê jî hişt ku kes, kesî qebûl neke û cî û war li xwe teng kirin.

Di encamê de, xelas û dermanê xwe di koçberiyê de dîtin û ew xewnên salan, durişmên bi deng, gotin û xebat...tev li ber ba çûn û winda bûn. Dîsa bûn xewn, lê vê carê li welatê xerîbiyê.

Duyemîn sedem Erka xweparastinê ye. Wekî kesayet ez vê gavê pir pîroz dibînim û ev nerîna min e . Lê wekî civak, bi vî rengî lê nanere û gelek kes li dij vê gavê sekinîn.

Hinek li sedema yekemîn vedigere; lihevnekirina siyasî û tirsa malbatan li ser zarokên xwe(malbatên ne girêdayî)û hin jî vedigere li şêwazê birina endaman. Dîsa, di encamê de milet xortên xwe derdixin derveyî Rojava.

Sêyemîn sedem ew e ku hin biryar têne sitandin bê ku milet jê re amede be; wekî guhertina rêbazê dibistanan her sê sal bi hev re (Ev bi xwe mijareke girîng e û em nikarin nuha li ser bisekinin) wekî mînak milet jê re ne hazir bû ji ber ku di nava milet de kar û xebat jê re nehat kirin. Ev rastiyek e, divê ku mirov lê mikur bê. Ji ber vê jî encam di destpêkê de ters hat û gelek malbat di bin navê xwendinê de bar kirin û zarokên xwe birin bajarên din.

Çaremîn sedem, propogendaya ku ji koçberiyê re hat çêkirin û Ewropa li ber çavan kirin buhişt . Ta digotin: Ev îmkanên ku çêbûne û deriyên ku hatin vekirin, sed salên din hew çêdibin.

Ragihandin bi her rengên xwe, hemû rewşenbîr û nivîskarên ku dikarin civakê hişyar bikin û êşa milet ber bi çav bikin û xwedî helwest bin, di ber de vê propogendayê de berpirsyar in.

Lê mixabin ev jî tune bû û rewşenbîrên me berî..

Çima Civaka Me Ji Ragihandiê Ditirse?

Dilşad Xalid

Salên berî 2011'ê, bi zordarî, tirs, girtin û kuştinê dagirtî bûn, ji lew re welatiyên Sûryayê bi tevayî û yên herêmên Kurdî bi taybetî ji ragihandinê (Anku derbirîna nêrîna xwe bi şêweyekî azad), ditirsiyan.

Behara Gelan tîrêjên xwe avêtin ser gelê Sûrî. Dîwarên tirsê herifîn û tevî ku rêjîm hêj jî nehatiye herifandin, lê helbet ew ne bi hêz û hebûna xwe ya berê ye û ev yek bû sedem ku li bajarên Sûryayê bi dehên sazî û dezgehên ragihandinê vebin.

Her wiha ev rewş li Rojavayê Kurdistanê jî peyda bû û derfeteke zêrîn hate pêş ragihîner û rojnamevanan, ku karê xwe heta asteke baş bi azadî bikin.

Tevî ku hejmara rojnamevan, ragihîner û dezgehên ragihandinê nema tên hejmartin jî; lê ya ku mirov matmayî dihêle ku çima heta nuha hêj jî xelk ji kamîra û recorderê (Alava tomarkirina deng) ditirsin, gelo sedem çi ne?

Di baweriya min de, dema ku mirov bixwaze sedeman nas bike dê li hemû aliyên tabloyê binêre, wê çaxê ew ê baş bibîne ku ne tenê sedemek, lê gelek sedemên vê tirsê hene.

Weke ku min li jor jî diyar kir, di dema destpêkê de Be'is de tirseke mezin li cem xelkê hebû û ne hesan e ku ew tirs di demeke kurt de hilweşe; û li şûna wê bixwebawerî were çandin.

Her wiha Rêveberiya Xweser a Demoqratîk jî ew derfeta mezin nedaye ku ew bawerî li cem welatî û rojnamevanan ava bibe, ji ber ku ne veşartî ye bê çend binpêkirin der heqê rojnamevanan de hatine kirin, bêyî ku tu encam ji lêkolînan derkeve, eger lêkolîn hatibin kirin.

Di raporên salane yên rêxistin û navendên belgekirina binpêkirinên der heqê rojnamevanan de, ev yek teqez dibe.

Sedema duyem jî ku ez dikarim bibêjim ew jî rê li ber welatiyan digire ku ji ragihandinê bitirsin û nikaribin bi azadî nêrînên xwe derbibirin, nakokiyên siyasî ne. Ji ber ku gelek mijarên ku di ragihandinê de cih digirin girêdayî siyasetê ne, lewra ji tirsa ku li hêla aliyekî siyasî bêne rêzkirin xelk xwe ji ragihandinê dûr dixin.

Tevî ku ev ne demeke dirêj e ku derfet ji bo karê ragihandinê hatiye vekirin, lê heft sal jî ne hindik in ku ez weke karmendekî di warê ragihandinê de êşa miletê xwe û gazinên wî nas bikim û weke min jî hemû ragihîner û rojnamevan.

Li bajarê Qamişloyê weke mînak, tu di kîjan kuçeyê re derbas bibî tu yê herî kêm kesekî ku di warê ragihandinê de kar dike bibînî, lê tevî wilo jî ez di wê baweriyê de me ku me weke rojnamevan, ragihîner û dezgehên ragihandinê heta nuha ew gavên wêrek ber bi miletê xwe ve neavêtine û em bi erkê xwe ku em dengê miletê xwe û nûnerên gotina azad bin ranebûne, ji xwe hinek hewildanên fedyok ne tê de.

Ji bo ku em karibin bi rastî nêzîkî civakê bin û tirsa dilê wê bişikînin, pêwîst e berî her tiştî yê rojnamevan dema ku berê kamîreya xwe bide civakê, armanca wî ya sereke ew be ku ronîkirinekê biavêje ser êşa wê civakê û dengê gelê xwe bigihîne aliyên peywendîdar; ne tenê ew karê xwe biqedîne da ku destvala li dezgeha xwe venegere.

Li kêleka vê gavê jî, ji desthelatê tê xwestin ku di nava yasa û zagonên xwe de azadiya ragihandinê biparêze, da ku yê rojnamevan karibe nameya xwe bigihîne û milet jî ji kamîreyê netirse.

Nerîneke Xemgîn li Ser Civakê

Ebdulhekîm Ehmed Muhemed

"Civak ahengeke xweveşartinî ye, em rûyên xwe tê de vedişêrin", ji vê pevoka fîlosofê Amerîkî Ralf Wardo Emerson (Ralph Waldo Emerson) em dikarin civaka xwe binirxînin û hin zorkêşên ku civak tê re derbas dibin, diyar bikin.

Bê guman li her çar kinarên cîhanê, xirecir û netebatiyek heye; çi ji şerên bê ser û ber be, çi jî ji nakokiyên olî û abûrî be. Lewma gelek civak ketin bin bandoreke neyînî ya van sedemên bihurî û bi pêşketina teknolojî jî, çavbelbûneke diyar di cîhanê de çêbû, û diyardeya koçberiyê ya miletên Rojhilata Navîn û Afrîkayê ber bi Ewropa û Amerîka ve, bûne sedem ku gelek civat tevlîhev bibin.

Ji destpêka avabûna cîhanê ve, di navbera civakan de ji hemî aliyan ve cudabûn heye, ev ne kêmasiyek e, lê kêmasî ew e ku civak di wê çarçoveya teng de bimînw û hewla lipêşxistinê neke. Li vir em dikarin bibêjin ku civatên rojhilatî ji wan civatên ku tu pêşketin û guhertin di warê xwe de nekirin. Gelek dibêjin ku sedema wê yekê ew e ku desthilatên vê deverê nehiştin ku tiştek çêbibe, lê ya rastî ne ev e, ev civat bi xwe naxwazin ku xwe biguherin û ew bi vî rengî razî ne.

Her wekî ku Emerson gotiye, em xwe di vê nezaniyê de vedişêrin.

Tevlî ku em li tevahiya cîhanê belav bûne, lê hîn jî em di wê çarçoveya teng de dijîn û dema ku em dixwazin xwe biguherin, em bi koratî û nezanî çav li civakine din dikin, lewra em dibînin ku gelek nakokî ji aliyên sincî, zanistî, siyasî û abûrî ve di civaka me de çêbûne.

Dema ku em piçek derft dibînin, em ji hemî prensîpên xwe derdikevin û berê xwe didin nebaşiyê; û em, di mêjiyê xwe de dibêjin ku ev pêşketin e (Anku guhertineke bi pêş de ye).

Gotineke din a Emerson li vir min mijûl dike, dema ku dibêje:"Eger tu bixwazî zanibî ka cira mêr bi hevjîn û zarokên wî re çawa ye, bibîne cira wî bi pirtûkên wî re çawa ye".

Mixabin, cir û sewda bi pirtûkan re di nimiztirîn pile de ye, êdî em nema dibînin ku kesek radihêje pirtûkekê û bi dilşewatî wê dixwîne.

Nema kesek qala çîrokeke evînî dike, di malan de tenê nakokî bandra xwe li zarokan dike.

Li vir bala min tê ser warê rewşenbîrî. Di civakên zana de mirov bi hevrikiyeke zanistî li hev dinerin û pêşbirkiyê dikin; lê di civaka me de tenê hevrikî ji bo rikberî û şkestinê dibe. Rewşenbîr dijî rewşenbîr radibe. Siyasetmedar dijî siyasetmedar radibe.

Her wiha maldar û nezan jî; şaristanî, çand, welat û neteweyê ji bîr dikin. Me hêj jî girêdana bi welat ve, pêşxistina çand û civakê, lihevkirin û hevpejirandin…baş nas nekiriye.

Her yek ji me xwe di ser van tiştan re dibîne.

Bê guman ev yek dide xuyakirin ku em civakeke nezan, bê bandor û bê paşeroj in.

Gerek em sûd ji ezmûnên xwe bigirin, her wiha ji civakên din jî qezencan bikin. Pêwîst e civaka me di warê xwe de guhertineke ciddî û dirust bike. Tê xwestin ku berjewendiyên giştî ser ên taybet re bin. Di ramanên xwe de azad bin û azadiyê bidin hawîrdora xwe.

Her wiha pêdivî heye ku em mafên xwe nas bikin û erkên xwe bi cih bînin, dûrî galegal û gotegotan bin, hezkirinê belav bikin û di pêşketin û şaristaniyê de, handana nifşên nuh bikin.

Ramangîrên Dilsoz…Heyvanên Pêşketina Civakê ne

Şiyar Silêman

Tevahiya gelên cîhanê di qonaxên cûrbicûr re derbas bûne.

Di hemî serdeman de, kar û warên cûrbicûr ên jiyanê pev re hatine birêvebirin; çi ramangîrî bin, an zanistî bin an jî wêjeyî bin…

Û di wan birêveçûnan de serkeftin heye, şikestin heye û her wiha rawestan jî heye. Lê ji bo ku miletek karibe jiyana xwe berdewam bike û li ser hemî astan bi pêş de biçe, her dem sûdwergirtina ji serboriyan tê xwestin, ji ber ku bi saya serborî û ramanên zana û afrêneran, şaristanî tên avakirin.

Her wisa asta pilebilindiya gelan, ji çawaniya rêzgirtina wan ji sîmbol û şehrezayên wan re tê nasîn, lewra divê ku "Mirov" bi duristî bên avakirin, da ku zanibin çawa sîmbol, pêşewa û zanayên xwe destnîşan bikin û rêz li wan bigirin.

Di serpêhatiyeke "Iskenderê Mekedonî" de, hatiye ku carekê leşkerên wî di şerekî de bajarek wêran kiriye. Û dema Iskender bihîst ku ew bajar warê helbestvanekî ye (Ku berê mamosteyê Iskender bû), û helbestên wî bûbûn beşek ji çanda giştî di nava gel de, êdî ji ber hebûna wî helbestvanî di bajêr de, Iskender ferman da ku careke din ji nû ve ew bajar bête avakirin.

Dema ku em dîroka gelê Kurd di warê wêjeyî û ramangîrî de vekolin, em ê navine payebilind bibînin; wekî: Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Babe Tahirê Hemedanî, Elî Herîrî û hwd…

Eger Kurd wekî miletekî desthilatdar dîroka xwe bi rastî vekole, dê ev lîsteya payebilindan pir dirêj bibe; lê ji ber dîrok bi destê desthilatdarên biserketî tê nivîsandin, îcar her fermandarek dîroka xwe li gor berjewendiyên xwe dide nivîsandin.

Zanayên Kurd ên gewre, cihê xwe yê berz ê li gor ked û têkoşîna xwe nabînin. Ev yek jî ji ber nebûna desthilata Kurdî û kêmasiyên ku ketine kesayetiya mirovan di civaka Kurdî de, ye.

Di dîroka Kurdî ya nûjen de, di serdema sedsala bûrî de, eger em wê qonaxê bêxin pîvanên nirxandinê de, em ê navên mezin bibînin ku li gor şert û mercên wê demê wan karîbû bi karên mezin rabin, û bibin ronî û çira ji rêya gelê xwe re.

Wekî mînak, dema em behsa Cegerxwîn bikin, tevlî ku bawernameya wî ya zanistî xwendina zanistên oldarî bû û tenê feqetî xwendibû, lê wî karîbû bi zîrekî û bi zanebûn bibe wêjevan, zimanzan û dîroknas. Her wisa karîbû berhemine giranbuha ji gelê xwe re pêşkêş bike.

Ya balkêş jî ew e ku wê hingê, di nava civaka gelê Kurd de Cegerxwîn bû şoreşek û roleke xwe ya pir girîng lîst…û bandora wî ta niha jî li ser hemî rewşenbîr û xwendevanên gelê Kurd heye , ji ber wî bi dilsozî rahiştibû barê gelê xwe.

Ne tenê Cegerxwîn, lê belê gelek navên dîtir jî yên wekî: Celadet Bedirxan, Tîrêj, Mele Ehmedê Palo, Bêbuhar û Hesen Hişyar… her yek ji wan di warê xizmeta gelê xwe de, çîrokeke wî ya mêrxasî û têkoşînî ya tracîdîk heye.

Dema em bên ser rewşa gelê Kurd a niha, em ê bibînin ku hejmara xwendevanan û ya xwedan bawernameyên bilind pir mezin e.

Tevlî derfet û alavên berdest ên wek computer, enternet û hemî torên peywendî û ragihandinê, lê keda ku nifşên berê kirine, tevlî hemî fişaran û kêmbûna amûran, ji ya nifşê niha balkêştir e.

Divê mirov li ser vê rastiyê bi kûrahî û hûrbînî raweste, di demekê de ku hemî alavên pêşketinê yên berdest hene, gelo çima em nikarin xwe bighînin gelên hevçaxên xwe? Ji bo serastkirina rewşê, îro ji her kesî tê xwestin ku li civaka xwe bi xwedî derkeve, her kesek li gor piyavê tê de kar dike .

Gerek e di warê wêjeyê de vekolînên zimanî û wêjeyî bi pêş de herin, da ku wêjeya Kurdî geştir bibe.

Divê ku kesên di piyavên zanistî de dixebitin, karibin wê zanistê bêxin di xizmeta gelê xwe de, hewl bidin ku wê bi zimanê Kurdî re jî biguncînin, û li gor taybetmendiya pîşeya xwe alîkariya zimanzanan bikin. Ji ber ku xwediyê her pîşeyekê, gerek e di zarewayên pîşeya xwe de zimanzan be.

Her wiha sazkirina rêxistin û sandîkayên pîşeyî yên xwecihî û Kurdistanî ji bo lipêşxistin û pevguhertina zanyariyan û bikaranîna wan ji rajeya civakê re, ew jî pêdivî ye.

Û li gor tiştên bûrî, tê naskirin ku bingeha avakirina her tiştî, zanebûn û raman e.

Her wiha bîr û boçûn dibin bingeha avakirina kesayetiya mirov û civakê, da ku ew mirov bibe hêmanê lipêşxistina welêt.

Her wiha divê ku ew mirov bibe navgîna maliştina toza bindestiya salan, hetanî ku em jî bibin wekî tevahiya gelên cîhanê yên pêşketî û xwedî şaristanî û sîmbol …pê re jî şarezayên me cihên xwe yên şayist di nava navdar, mezin û afrênerên vê zemînê de bigirin.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Helbestine Bijartî...Ciwanê Dêrikê

Seydayê Jana Min

(Diyarî rewanê Seydayê Mele Beşîr ê Tirbespiyê)
Erê seydayê jana min? te jî xatir ji me xwestin
Ev e sih sal e pêşeng î? te mal û can hemî bestin
Ji boyî Kurd û Kurdistan te pir ayet ji mer ristin
Seferber bûyî her çaxî? çima Kurd tev ne yekdest in
Te ala netew û olê? hejand bê tirs û rawestin
Evîndarê dirustî bûy? te dur siftin? çi helbest in!!
Gelek tehlî û şoravî di vê jînê de ho gestin
Dizanim bo tekoşînê bi baran nirx te paristin
Bizane peyrewên dilsoz li pey te b'vîn û helwest in
Çûna te zor e seydayê'm? ji lew em îro sermest in
Belê her zindî û saxî wê şûrê te neyê şkestin
Tu ma sembol ji Kurdan re? cihê te dil de raxistin..

EVÎN

Li ser kendalekî
Raserî derya te
Li pêl û bahozan
Dîdariyê dikim..
Sîpanê Xelatê? min gurxweş dike
Dilê min jî heye
Xwe bavêjim kûraya te..
Ne Siyamend im
Ne noqar im
Melevanekî ji rêzê me..
Ji nişka ve
Tsonamiya dilgirtina te
Li min dide
Şanikên hestê min ên razayî
Dike lehî
Min li ber xwe dibe
Dibe û dibe..
Ez jî pê re dikelim
û
Xewnên xwe distirînim...

Ciwan Dêrikê, di sala 1962'yê de li gundê Kasanê ku girêdayî Dêrika Hemko ye, ji dayîk bûye.
Xwendina xwe ya seretayî li gund û ya navîn li Dêrikê diqedîne.
Di sala 1981'ê de li bajarê Hesekê tevlî Peymangeha Mamostetiyê dibe û bawernameya xwe li wir werdigire.

Dilbija Awazên Çiya

Ji bo sitrana azadiyê tomar bike
Ji hêlîna xwe firî
Li serê çiya rêsî
Firişta welatê çiya…
Bi dengê xwe yê zîz
Çiya bi bejn kir
Bi kenê çavên xwe
Pesar bi gul kirin
Kete nav refê bazan
Û bû bazek perzêrîn
Ezmanê welatê min
Bost bi bost dipîva
Rewangehên azadiyê lê dikirin..
Di nav dilê çiya de
Bi teng û beng bû
Bi xweziyên pîroz hate avdan
Û mezin bû…
Navê pakrewanan lê bû
Bi dengê wan geş bibû Nejbîr
Jixwe bûye çand
Pakrewan neyên jibîrkirin..
Her şev.. xewna govenda çiya didît
Bi pey xewna xwe ket
Û bû dîlanvana çiya
Keçka xewnmezin…
Xem û hejarî bi awirên xwe guvaştin
Danîn ser perên xwe
Û firî?
Firî û berba kirin
Li teht û zinara dan
Axîn û keser.. bi hêlemeka çiya re berdan
Tûrê hêviyan hilgirt
Bi çar aliyan ve reşand…
Bi qijak û sîsalkan re şer kir
Bi dûpişk û weybaban re
Bi hirç û guran re
Meydanên dîlanê fireh dikirin
Bû palevana hêvîweş
Navê xwe kir stêr
Bi stêran re dikenî
Ristikên geşestêran diyarî jîna azad dikirin…
Ne westiha?
Ciwan bû?
Dilgerm bû?
Şagirta rêberan bû?
Sozdaya rojê bû
Keça rojê..
Li kû ba bihar diçand
Nedixwest ji biharan derkeve
Lewra Sibata reş û tarî
Di bihara temenê xwe de
Bi xwîna xwe kire bihar
Zozan û baniyên Xerzanê
Xemilandin bi nêrgiz û şilêran
Bi gulberfînan…
Kî dikare şîna bilindbûna hêviyên te bigire
Nejbîra bedew?
Çi hest dikarin bi rondikan
Xemgîniya xwe nîşan bikin
Ey stêra karwanan!!
Kela dilê min têrê nake
Te pênase bikim
Bahoza hestan li min dide
Lê nikarim li ser te bêjim..
Pênûsa min? li ber deryê navê te şermokî radiweste
Lal dibe…
Ma hin hene karibin firiştan birewş bikin!!
Tenê Xuda mezibûna we dizane rêwîno
Tenê xweza evîn û dildariya we Dinase
Tenê berf axîna bêrîkirina solên we dikişîne
Erêêê? ew sirûşt tenê bi şahî û xemên we agehdar e
Keça çiya…
Awazên te?
Sitran û dîlanên te
Dimînin sirûdê mendalan
Di xaka xemlandî bi wêneyê pakrewanan de…
Oxir be dengxweşa min
Stêra ezmanê welatê min
Her êvar.. ez ê çavê xwe
Bi çirîsên te bikenînim
Û xewnên te ramûsim û vebêjim.

Ciwanê Dêrikê bi qasî 28 salan li dibistanên deverê mamostetiyê dike. Bi destpêbûna Şoreşa Rojava re tevlî xebatên wêjeyî û zimanî dibe, ev jî dibe sedema wê yekê ku ji karê mamostetiyê bête avêtin.

Şoreşa Hemdem

Kî dizane ev evîna min ji kîj kanyê dize
Rêçejîna min dirêj e zor û sar e? hem giz e
Min mirovatî xwedî kir ev Kevana Zêr e mak
Cûdî nasnama min e? hêj Nûh hevalê Hirmiz e
Sûr û ew bircên belek? ev berxwedana dûvdirêj
Hûrî? Mîtan û Med im dengê çiya me ez ji mêj
Merd û nander û dilêr? serdarê Kurdistan e hêj
Çendî Ehrîman hebin rayê mi kûr e narize
Şoreşa min şax veda dengê siwaran rimrim e
Ser hila Kurd? raperî? wî koletî lêda rim e
Şan û nasname Gerîlla got; ji bo we hatime
YPS zû pêxe volkan kar çi nirx û pakiz e
Erê Xanî! Hew dinale Mem di zindana di kûr
Lo Cizîrî! Xweş bihûn ristan bi wî cergê kizûr
Va giyanê Mehyedîn? Bêrî? diterqîne xemûr
Îro paytexta Botan şêr û egîdên nû dize
Nevyên Osman û Selîm! Hûn hew dikarin me bixwin
Nan û mûçê çetetî pê vedreşin û dikuxwin
Şêr û çalak û nebez bend in li her alîw rex in
Em ji tirkîtî rihan? Kurdîtî şîrîn



û miz e
Xweserî navê min e? mafê min e? rengê min e
Rê nedim çavsor û hov? doza min e? dengê min e
Sibe sed wek Erdogan wê çok de ber lingê min e
Felsefa jîn ser kete? wê bqeşte nankor û diz e
Berxwedan û berxwedan? şoreş tirêna rêketî
Bend û çember hilweşîn? Kurd bû çiraya vêketî
Bû nimûna serketî? dîrok de mor e lêketî
Şahî ye? dîlan û cejn e? bablekan û hûriz e

Şoreşa ROJAVA

Şoreşa rojava pêket şoreşa dij tengijî
Wek kuleh ser me de hatin dilreşî tev gurijî
Dane ber xwe nav dîrok kirne enfal xakî Kurd
Dewleta islama sexte da li vir al rahejî
Dane Harbagosan hestî rê kirin dirh û stirî
Da tirêna me lewaz be neghe qûnaxa xwe jî
Lê nezanîn rustemên Kurd sing vegirtîne li ber
Şîrmijên bîrdoza Apo ji evînê bûn tijî
Nameya azadiyê tîrêj belave çarmedor
Guh bidêrin ev ne xewn e xweserî hat û pijî
YPG dîwarê pola bobelatan pûç dike
Rivda pêxwas û çetan? rihgaz hemî ber terpijî
Aştiya rastî didêre? wer ji bo şer ser piya
Rim li rimya agirî da? xweş siwar e nahejî
Îro axa Hûr Mîtan zîl dide jîn û hebûn
Lew bi xwîna pakrewanan qad

sekretêr
Ev gelê çalak û zindî wek tenûrê germijî
Wê bipêje nanê jaran nirx û rûmet dane pêş
Koçber û aware nabe wê bi vîna xwe bijî
Qederê vajî dikin sed tif li dîroka derew
Ku hebin? kî himber e pakî me nine jmêrkujî
Şêr-şepalên ypg bend û enî parastine
Tev kurên jar û belengazan e şoreş pê vejî
Sing kirin mertal li hember tang û topên Daişê
Da çira azadiyê geş be? neyar pê bit rijî
Gundî û kedkar û rêncber ajovanên dil bi soz
Saziyan ava dikin? rêve dibin av û bejî
Her bijî rêbaza jînê hemî pêkhate di nav
Xweserî modêla hemdem rêça pak û paqijî

Di zaroktiyê de, bavê Ciwan bi awayekî berdewam helbestên Cizîrê dixwendin, ji vê yekê heyvanê zimanheziyê di giyan û mejiyê Ciwan de dimeye.

Sala 2017an

Bi xêr bî salê
De bajo
Te gelek êş û azar li pey xwe hiştin
Te gelek serketin û deskeftî jî hiştin
Çemên rondika te derbas kirin
Bi hezaran konên sersaxiyê
Bêndera xeman.. ji bayê dêranê re ma..
De bajo salê?
Çember û zinarên guvaştinê rizî bûn?
Derûna hejayî û çavtirsandî..
xweş dibe
Li dûûr dinêre…
De were salê
Tirsa ji jiyanê şewitî
Postê şivantî û qerwaşiyê pijilî û nema tê wergirtin
Çav dikenin
Dil dikenin
Mejî dikenin…
Şahiya li pey şînê ye
Taca li serê dayîkan diçirise
Vînê diweşîne
Rewan gur dike ji paşerojê re
Karwan î tajo…
Erê salê?
Siwar siwar in
Ne westan? ne rawestan
Barê hêviyan.. qûnax qûnax datînin
Mûm û feneran jî pê re pêtêxin…
De bajo salê
''sa direyê û karwan diborê''
Li direh û stiriyan nesekine
Rûreş û bedkar çavtirsandî bûne
Beko? Beko
Keysebaz û xêrnexwaz
Xwe tavêjin nava dîlanê
Dest? ling? serî û milan bigermî dihejînin
Li serê civatê rûdinin û pesnê mêraniya xwe jî didin
Ne ev tinê
Rê nadin pale û kedkaran jî…
Erê salê
Tu têyî
Baweriya me xurt e
Parêzvanên rastiyê? wê te jî bavêjin rûpelên dîrokê
Lê bi xemlek nû?
Bi navek nû?
Bi rêbaz û pîvanin nû…
De were salê
Çav li te ne
Li benda zan û berê te ne
Li benda mizgîniyên çar demsalên te ne
De were salê
Evînmezinê
Dîrokvejînê
De were
Were.

Ciwan Dêrikê 6 berhevokên wî yên helbestan hene, tenê berhevoka bi navê "Xwedawendên Bedeweiyê" çap bûye. Aniha Ciwanê Dêrikê, mamosteyê Wêjeya Kurdî li Zanîngeha Rojava ye.

Pakrewan

Kulek di dilê min de hebû ew kul te sax kir
Hiş û mejiyê min pê vebûn gava te dax kir
Hêrs û germiya te melhema derd û birîn bû
Xwîna te bû ava jîn gelê Kurd pê heşîn bû
Her gava te avêtî heşîn bû pey hezar gul
Her dilop ji xwîna te rija sax kir hezar kul
Pesnê te nika bidim bi kaxez û bi xama
Tenê dikarim bêjim: xwezî ez wek te bama

Kultûrname

FOLKLOR

Zeynulabidîn Zinar

Peyvika folk wateya xwe bi kurdî ango xelk, peyvika lor jî bi wateya zanîn/zanist e. Îcar dema ev herdu peyvik gihane hev, wateya zanistiya gel dide û di Kurdî/Kurmancî de jî bi wateya gelêrî tê gotin.

Peyvika folklor cara pêşî li Londrayê sal 1846, ji aliyê William Thomasî (1803-1885) ve di kovara Athenaeumê de hatiye bikaranîn. Vî camêrî, ev peyv wek Folk-lore bi kar aniye. Piştre jî Elmaniyan peyvika folkloreyê bi kar aniye. Hin bi hin ev peyv li dinyayê (Xasma jî li nava neteweyên ku zimanê wan Hinoewrûpî ye) belav bûye her wisa ketiye nava zimanê Kurdî jî.

Peyvika "folklor" di nava xelkê de, ji van tiştan re tê gotin: Li welatekî, di nava gelekî/neteweyekî de, yan jî li herêmekê, ew çalakiyên taybet ên ku xasê bi xelkê ve lê ji aliyê xelkê ve bi nêvekarî têne bikaranîn, bi piranî jî di nava xelkê de ji tiştên mîna çîrok, meselok, stiran, leyztik, dîroka devkî, evsane, serpêhatî, destan, henek û laqirdî, gotinên pêşiyan, tore u hwd. re tê gotin.

Lê belê peyvika "folklor" bi vî hawayê li jorê ku di nava xelkê de tenê ji van tiştan re tê gotin, ne rast e. Lewra folklor bi wateya xwe ya ferhengî, gelek fireh e û ji hemû tiştên ku têkiliya xelkê bi wan tiştan re heye re tê gotin.

Folklora Kurdî ew tiştên çandî ne ku tenê yên Neteweyê Kurd in, wek çîrok, çîrvanok, çîrokên rawilan, sitran, meselok, pêkenok, serpêhatî, heyranok û payîzok, şîret û nesîhet, Gotinên Pêşiyan, biwêj û hwd...

Bêguman folklora her neteweyî, girêdayê bi çanda wî neteweyî ve ye. Eger çanda neteweyî dewlemend be, folklora wî neteweyî jî dewlemend e. Eger çand lewaz be, folklor jî lewaz dibe. Yanî folklor, wêneyê xwe ji yê çanda neteweyî werdigire.

Folklor serwet, saman û şanaziyeke wisa pîroz û giranbiha ye ku ne jê re nirx tê hesabkirin, ne jê re kêşan heye û ne jî pîvan çêdibe. Her wiha folklor ji her neteweyekî re wisa girîng e ku ew netewe bi alîkariya berhemên folklorî, xwe ji mirina neteweyî rizgar dike.

Ev yek eşkere ye ku hemû miletên pêşketî yên ku îro li dinyayê xwediyê dewleta xwe ya nûjen in, vê çanda xwe ya heyî li ser du bingehan ava kirine.

Yek berhemên wan ên folklorî ne.

Dido berhemên wan ên klasîk in. Îcar ji ber ku Folklor jî di Çanda Kurdî de beşeke girîng e, bi naskirin û têgihandina Folklora Kurdî, du pêdiviyên dewlemend derdikevin holê...

Berdewamî di hejmara bê de ye...

Berhemên Nû

Bi Navê "Zordestname"...Berhemeke Ebdilrehman El-Kewakibî Ji Bo Zimanê Kurdî Hat Wergerandin

Di 12'ê meha 11'ê li sala 2017'ê, wergera Kurdî ya pirtûka Ebdilrehman El-Kewakibî ya bi navê (طبائع الاستبداد), ji weşanên Projeya HINARê ya Çandî derket. Nivîskar Ibrahîm Xelîl bi navnîşana "Zordestname", pirtûka El-Kewakibî wergerandiye zimanê Kurdî.

Sitêrname 6

Narîn Omer

Her ku em der barê dîroka huner û dengbêjiya Kurdî de vekolînên kûrtir bikin, em ê ji ber êş û janên ku wan dengbêj û hunermendan daqurtandine(Bi taybet hunermend û dengbêjên jin), mat bimînin.

Tevlî vê yekê jî, ewan hunermendan kar û xebata xwe berdewam dikir û asta hunera Kurdî ber bi bilindbûnê ve dibirin.

Her timî berxwedaneke bêhedan li hember rewiştên civakê dikirin, û dixwestin ku êdî civaka wan bi çavekî erînî û baş li wan bihinêre.

Yek ji wan dengbêjan "Belga Qado" bû.

Xudana dengê zîz û zelal, ku li pêşber civaka xwe rawestiya û barê bipêşvebirina hunera gelê xwe, bi dil û can hilgirt.

Belga Qado, di sala 1924'ê de li Ermenîstanê ji dayîk bûye.

Hunermenda kurd "Aslîka Qadir" li ser wê diaxive, û wiha dibêje:

"Belga pir rind û cansivik bû. Ew dilsoza civaka xwe û gelê xwe bû, û bi dilpakiya xwe derbasî dil û mejiyê heval û derdora xwe dibû. Ew bi sinc û rewiştên xwe ciyawaz bû".

Aslîka her wiha didomîne, û dibêje:

"Mixabin Belga li gor dana wê ya bêhempa, mafê xwe wernegirt. Wê dengê xwe, hest û salên ciwaniyê diyarî gel û civaka xwe kirin; lê ew pê re şaşyar derketin".

Belga Xanim xwest ku mîna Sûska Simo, Fatma Îsa û Zedîna Şekir deng û hestên xwe bigihîne gelê xwe yê li Kurdistan û hemî deverên din... Lewra tevlî Radoyaya Êrîvanê (Beşê Kurdî) dibe, û çend sitranan tomar dike; ji wan sitranan: Kew Hêlûn, Weylûr û De felekê.

Û bi van sitranan nav û dengê wê li nava gelê wê û gelên din belav dibe.

Paşê dest bi çêkirin û vejandina aheng û festîvalan dike, û mirada xwe pêk tîne.

Dîsa em ê bibêjin mixabin! Û em ê dubare bibêjin ku ev hunermend wekî gelek hunermendan di dawiya temenê xwe de pir azarî û janan dikişîne; û milet û civaka wê, pişta xwe didinê.

Xaleke pir nebaş di jiyana wê de hebû, ew jî tê gotin ku:

"Hevjînê wê cirnexweş bû. Pir zordarî lê dikir, û gelek caran bi lêdan û dijûnên çewt ew diêşand. Lê ew jineke aramxweş û bi rûmet bû. Tevlî hejarî û zîvariyê, wê ew qas tişt dadiqurtandin... hetanî ku xem û derd lê civiyan û bûn hevalên temenê wê".

Belga Qado...1924 - 1980

Dawiya Belga Qado:

Cendekê wê yê nazik hew dikarîbû bi can û hestên wê re li dinê berdewam bike. Hêdî hêdî can ji cendek vedikişe, û hunermenda me çavan miç û bel dike û xwe dibîne bê hezker, bê heval û derdor. Êdî çavan digire û di sala 1980'î de bi aramî bar dike.

Belga Xanim bar dike, lê hêj jî banga wê, ujdanê me dixepêre û pêwîstiya guhpêdanê, ji bo me vedibêje.

Bi zelaliya dengê xwe, ji me dixwaze ku em di nerîn û helwestên xwe de, der heqê wê û hemî hunermendên wekî wê de, rastbêj û ne nankor bin.

Kurdî Xweş e

Rojhilatnas مستشرق	Geşbîn متفائل	Revend جالية	Vejandin إحياء
Gewre عظيم	Reşbîn متشائم	Çarçove إطار	Temaşevan مُشاهد
Şêwirmend مستشار	Pêşbînî توقع	Angaştin إدعاء	Zimanzan عالم اللغة
Civaknas عالم اجتماعي	Romanivîs روائي	Perwer وفي_مخلص	Awazjen عازف_ملحن
Handêr kirin تشجيع	Şanoger ممثل مسرحي	Kurtebirî ملخص	Werzîş رياضة

Xaçepirs

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1									
2			■				■		
3					■	■			
4			■				■		
5		■		■					
6	■				■				
7			■			■			
8				■					
9				■					

Sitûnî

1-Tîtan belavkirî_Ji rengan

2-Amûr_Ahîn (Vajî)

3-Dijwateya erê(Vajî)_Du tîpên wekhev

4-Kanî belavbûyî_Du tîpên arî

5-Neyîniya dema niha_Agir bi kurtî_damar

6-Du tîpên wekhev_Ji ajalên xişok(Vajî)

7-Birêz

8-Kesê rêya xwe winda dike

9-Vîn bi Erebî_Dijwateya girînê

ASOYÎ

1-Gunehkarî

2-Sîmbola her welat û saziyekê_Dijî girî (Vajî)_şop(Vajî)

3-Dijwateya ronahiyê_War belavbûyî

4-Cînavka şanîdanê ya nêzîk(Vajî)_Xebat_De (Vajî)

5-Cihê ku mirov tê de maddeyên bazirganiyê dihilîne(Vajî)

6-Nan belavkirî_Bavikên Kurdan

7-Rih kurtkirî_Du tîpên wekhev

8-Şeh belavkirî_Belê

9-Çewt_Hunermend

Amadekirina Xaçepirsê: Îsa Bavê Siwar

Peyva Windayî

Da ku tu peyva windayî bibînî, van navan bi awayekî sitûnî xêz bike:

Dûr-Danişt-Karwan-Qûl-Zerî-Kavil-Berbû-Qutî-Qurnaz-Zîvar-Perî-Têr-Rojî-Ajot-Ajdan-Rizgar-Wêje-Meraq-Hêzda-Derz

Peyva windayî ji 9 tîpan pêk tê, ew jî navê Seydayê Tîrêj ê rastîn e.

k	a	r	w	a	n	n	d	û	r
b	e	r	b	û	l	z	e	r	î
d	e	r	z	m	m	e	r	a	q
q	u	r	n	a	z	e	t	ê	r
p	e	r	î	e	z	î	v	a	r
a	j	d	a	n	a	a	j	o	t
h	ê	z	d	a	y	w	ê	j	e
r	i	z	g	a	r	r	o	j	î
q	u	t	î	i	k	a	v	i	l
q	û	l	f	d	a	n	i	ş	t

Bersiva Xaçepirsa Hejmara Çûyî

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1	t	a	w	a	n	k	a	r	î
2	a	l	■	n	e	k	■	ê	r
3	t	a	r	î	■	■	r	w	a
4	î	v	■	k	a	r	■	e	d
5	n	■	a	■	r	a	b	n	e
6	■	n	n	a	■	m	e	d	■
7	r	î	■	r	r	■	r	a	k
8	e	h	ş	■	e	r	ê	■	e
9	ş	a	ş	■	h	o	z	a	n